Nordkurdiska
Trygga människor vågar

Mirovên je xwe ewle diwêrin

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Dikare bi serê me hemûyan were, ku em nexweş bikevin yan ji karê xwe bibin. Em hemû bi temen dibin û malbat jî fireh û mazin dibe. Ji lew re ye, ku me li Swêdê sîgorteyên ewletiyê (trygghetsförsäkringar) hene. Ev sîgorte gava hatina me kêm bibe, ewletiya aboriyê dide me. Anku gava em ji ber nebûna karî, nexweşiyê yan jî qezayê yan jî ji ber zarokên biçûk yan ji ber nexweşiya zarokan bêpere bin. Jiyan carinan diguhere û ji ber vê guherînê dibe, ku bêhtir pêwîstiya mirovî bi alîkariyê hebe.

Em Sosyaldemokrat me na vêt, ku kesê li nexweşiyekê rast were, yan jî fîrma kar bide rawestandin, hingê ew bêgav bimîne, ku xaniyê xwe bifiroşe. Her wisan jî me na vêt, ku zaro were bêgavhiştinê ku dev ji karguzeriyên xwe yên wexta xwe ya vala bigere gava dêbavek nexweş bikeve yan ji karê xwe bibe. Ji ber vê hindê xelk sîgorteyên bi dad divên, da ku bikaribe ewletiyê bide xelkê roja ku yan hatina wan kêm bibe (inkomstbortfall) yan nexweş bikevin, yan qezayek bi serê wan de were, yan jî ji bo sexbêriya zaro bêgav bimînin ku li malê bin. Ev ewletiyê dide her kesekî û her wisan ji malbatan re jî. Ev alikariya me dike, daku em diwêrin xwe bidin ser karê xwendinekê, xanîguherînê yan jî fîrmavekirinê. Ev dibe qezenca her kesî. Mirovên bi xwe ewle dikarin wêrek bin.

Modêla me ya swêdî li ser vê bingehê ava bûye, ku gava em xwedîkar in û li ser xwe ne, em piştgirvanê wan kesan, in ku pêwîstiya wan bi alîkariyê heye. Gava em li ser xwe ne û ma kar heye, hingê em beşek ji hatina xwe didin ji bo wan sîgorteyên beşdar, ku gava jiyana me bi xwe ber bi xirabiyê ve çû û me kar ji dest çû yan em nexweş ketin, hingê em piştgirî ji vir diwergirin. Ev Swêdê bêhtir dike welatê piştîvaniyê û ewletiyek zexm dide ku li gora kîsê her welatiyek e.

Heger tu bixwazî bibî endam, serdana vir bike: socialdemokraterna.se yan jî telefona vir bike: 08-700 27 27

Sîgorteyên ewletiyê em ên li Swêdê dijîn bi ewletir, xurttir û nebeztir dike. Em bi hev re li pêş civata milletan Swêdê bihêztir û vekirîtir dikin. Ev pêdiviyek e ji bo standarda me ya bilind û dewlemendiya civata me. Ewletî û pêşketina kesane, xurtbûn û dewlemendbûna netewiyê diafirîne. Ji lewre ye, ku sîgorteyên ewletiyê kevirek bingehîn a ji modêla dewlemendiya Swêdê ye. Ev ewletiyê dide me û derfetên ji bo xurtbûn û pêşketinê, derfeta karên nuh dide me.

Alternatîva vê
Li hevberî vê baweriya me ya li ser mirovên ji xwe ewle, Moderat û ew hevbendiya wan a ji baskê rastê (högeralliansen) hene. Li gor bîr û baweriya wan, gurê birçî nêçîra herî baş dikin. Moderat dixwazin ew parastina li nav sîstema ewletiyê bi kêmkirina mafê sîgorteyê û bi cîhkirina rojên bêpere (karensdagar), û rakirina mafê ji sîgorteyê perewergirtina bilind (ersättningstak), xirabtir bikin.

Ev dihêt wê wateyê, ku parastina ewletiyê ya li rewşa bêkarmabûnê, rewşa sexbêriya zarokan, rewşa nexweşiyê, rewşa rasthatina li qezayê li ciyê karî yan jî li rewşa sexbêriya zarokên nexweş, pir xirabtir dibe. Gelek mirovên nexweş û bêkar, ji nuha ve di bin sînorên aboriya dijwar de dijîn. Ma gelo wê çawa ji bo wan kesên, ku nexweşên gran in, yan jî wan karek nîn e, bikaribin bizivirin ser karekî, heger mafê wan pir were kêmkirinê, ku bêgav bimînın mal û xaniyên xwe jî bifiroşin?

Moderat partiya mûçexistan e. Bi riya kêmkirina pereyê bêkariyê (a-kassan) û pereyê nexweşiyê (sjukersättning), Moderat dixwazin bazarek nizm a mûçeyê ji dewlemendan re peyda bikin. Wê gavê ew ê ku nexweş e yan jî ne xwedî karekî ye, bêgav dimînin ku di karekî kêmmûçe de bixebitin, ku ev karê kêmmûçe ni kare debara jiyana wan cîbicî bike. Î car ev dibe sedem, ku mûçeyên tev xelkê din jî dihên kêmkirinê. Ev dibe gergeroka êşê ji tevan re. Gava mûçeyê xelkê kêm dibe, daxwazî li civakê kêm dibe û aborî lawaz dibe.

Ma kêmkirina mûçeyê ku Swêd bikaribe li bazara cîhanî xwe xurt bike, gelo ji bo Swêdê ev riya herî rast e? Em Sosyaldemokrat bi zanebûnê, jêhatîbûnê bawer in – ne bi ewletiya xirab û mûçeyên daxistî. Gava xurtbûna civata swêdî ji li nav Yekîtiya Ewrûpî ya herî bilind be, gava ku standarda jiyana li swêdê her ku dihere bilind bibe û dewlemendiya civata me ji temamiya civatên cîhanê jî bilindtir be, wê gavê ev nîşê me dide ku modêla me ya Sosyaldemokratiyê, modêla herî pêşketî ye.

Sîgorteyên ewletiyê beşek ji bersiva pirsa xurtbûn û dewlemendiya civata me ye û her wisan jî bersiva pêşketîbûna modêla swêdê ye. Sîgorte ewletiyê didin me. Ew li ser bingeha piştgirîvaniyê ava dibin. Ew derfetê didin da ku xurtbûn, pêşketin û karên nuh peyda bibin.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?